Dergehê Jîn û Evînê

Konê Reş

Çapa yekem: Şam, 2001

Derhêner û çapa dîjîtal
Sîrwan Hecî Berko

Wêne: M. Emîn Ebdo
Ji weşanên Malpera Amûdê
Hejmar: 30

**www.amude.com**
**info@amude.com**

Hemû mafên çapê parastî ne.
© Konê Reş û Malpera Amûdê ( 07/2003 )



# Konê Reş

# Dergehê Jîn û Evînê

## Helbest

## Rêhevala min [*]

*Ji giyanê rêhevala min*
*Semîra Ebbas Ismaîl*
*re diyarî*
*Konê Reş*
*22.04.1994*

Ji nû ketibû buhariya
Sîh buhar bûrandibûn
Ketibû buhara sîh û yekê de
Di wê buharê de
Pênc çêlî
Di hêlîna xwe de
Xwedî dikirin
Sê xibşên xezalan û
Du berxikên yemlik
Her pênc
Di bin baskên xwe de
Di parastin
Ji germ û serma
Havîn û zivistanê
Dema ku ji hêlîna xwe

---

[*] **Ev helbest di kovara «Metîn» de belav bûye, hejmara 33/1994, Duhok.**



## Diyarî

Ji her mirovê ku bi rast û durist xwe di ber avakirin, pêşketin û xweşiya welat û welatiyên xwe de diwestîne.

Ji her mirovê, ku ramanên mirovatî û hezkirina gelan di nav gelê xwe de diçîne, re.

Ji wan rewşenbîrên, ku sînga wan ji diyalog û guftûgoyê re fireh e…

Ji aştî, aramî û demoqratiyê re.

Konê Reş

Mendalên wê di hêlînê de
Kirin qêrîn, hawar û gotin :
Semîra yadê, Semîra yadê û
Tevan xwe li bavê xwe yê birîndar
Girtin.
Min jî bi dilovanî
Ew hembêz kirin û
Destê xwe di ser serê wan re
Bir û anî û
Konekî reş
Ji qedera xwe û
Qedera welatê xwe re
Di ser wan re vegirt

✶ ✶ ✶





Bi dûr diket
Ser û berê
Xibş û berxan
Lihev diketin
Nema dizanîn
Çi bikin, çawa bikin…
Wê jî ne dizanî
Çilo, çawa
Bizîvire nav wan û
Li wan bibane bi şahî
Wan hembêz bike bi evîndarî

✶ ✶ ✶

Di wê buharê de
Buhara dawîn ji temenê wê
Di roja pêncşema xemgîn de
Ji nîsana 1994an
Ji Şamê dizîvirî hêlîna xwe û
Bi rêde, ji nişkave
Rê qetiya !
Dinya gewr, reş geriya
Canê wê yê nazik
Firya jor, jor
Li banê gerdûn
Rawestiya

## Ez û kenê heyv û stêran*

Di nav nivînan de
Di pirsên polîsan de
Ponijîm û kûr çûm…
Di pêkanîna dirav û
Perwerdekirina zarokên xwe de
Mijûl bûm û
Pêre, pêre
Kul û xeman
Dan ser pişta min û
Xew ji çavên min
Dizîn.
Min çixareyek vêxist
Bi kişandina çend mizên wêre
Dîkekî li vî alî,
Melakî li wî alî
Bangdan
Giregira otomobîlekê jî
Di kolanê de dihat
Derbas dibû …

---

* **Ev helbest di rojnameya «Peyman, Edeb û huner»de belav bûye, hejmara 25/1999, Duhok.**



Piştî ku min li dor xwe
Meyzekir
Çavên min
Ber bi asman ve
Çûn
Min dît ku
Çawa heyv û stêr
Bi hev re dikenin û
Haj û bajê wan
Ji min nîne.



✶ ✶ ✶

Xerabo !
Çendî tu xwe veşêrî
Çendî tu xwe di ber
Pala rewrewkê de
Biparêzî
Çendî tu min
 Bixapênî
Wisa tu navê min
 Bilind dikî,
Stêra min
Geş dikî û
Pêre, pêre tu
Belû û eşkere dibî
Ji ber ku hin bi hin
Bêhna heyvanê te
Yê genî belav dibe

✶ ✶ ✶

Xerabo !
Ku tu neba
Bê goman
Wê Konê Reş
Yekî wek te ba

✶ ✶ ✶



## **Xerabo !** [*]

## ( 1 )

Xerabo !
Hebûna min
Ji hebûna teye !
Çêbûna min
Ji xerabûna teye !

✶ ✶ ✶

Xerabo !
Helbet tu xerabî
Ez çak û rind im
Tu dizî
Ez merd im
Tu revokeyî
Ez leheng im
Tu heyranê canê xweyî
Ez heyranê xweşî û
 Pêşketina gelê xwe me

---

[*] **Ev helbest di kovara «Peyv»de belav bûye, hejmara 11/1999, Duhok.**

**Xerabo !**

( 2 )

Xerabo !
Şiyarbe xerabo şiyarbe
Va dîkên serê sibehê
Bang didin û hêjî
Tu di xew de raketiyî !
Heyva me li çardaye
Hêjî, tu rê şanî gur didî !
Û berê gur li nav kerî
Rastdikî ?!
Qey tu korî an
Hovî, an zikreşiyê
Hiş û sewdan di serê te de
Nehiştiye ?!

✶ ✶ ✶

Şiyarbe xwelîlisero
Şiyar be !
Xweliyê ji ser serê xwe
Daweşîne !
Xelk, xweliya li ser serê



Şanî hev didin
Gur jî
Dibin simbêlan re
Bi te dikene
Kenekî hûr û bê deng dikî û
Haj û bajê te
Ji dora te nîne;
Bi tenê tu û zikreşiya xwe
Bi hev re dijîn
Bi tenê tu mayî heyranê
Razîkirina jina xwe û
Nexeme ku avanî bibin kavil
Bajarî bibin koçer…

✶ ✶ ✶

Xerabo !
Xelkê sol rizandin di ber
Avakirina welatê xwe de
Te sol rizandin
Di wêrankirina welatê xwe de
Bê guman tu jî
Hêjayî xelatkirinêye
Heger xelata welatiyên birûmet
Ji zêr be
Gerek xelata te

Sola welatiyekî
Dilsoz û wefadar be
Da ku li ber çavên zarokên te
Bê daleqandin û
Zarokên te li te neyên.

✶ ✶ ✶





## Ez delaliyên xwe li kê bikim[*]

Zarokên min
Ji ser taştê
Ta bi razanê
Delaliyên xwe
li min dikin;
Pevdiçin, digrîn
Ez jî bi wan de
Dixeyidim,
Li ber wan digerim
Ta ku ez wan
Haj û razî dikim…
Belê tiştek
Bala min dikşîne
Gelo! Ez
Delaliyên xwe
Li kê bikim
Wê kî min haj û razî bike ?!

---

[*] **Ev helbest di kovara «Peyv»de belav bûye, hejmara 9/1998, Duhok. Û di kovara «Jiyana Rewşen» de belav bûye, hejmara 11/1997, Stenbol.**

## Kes nabêje rehma Xwedê li te be [*]

Zengîno, maldaro
Li canê xwe tenê geryawo !
Li ser xwîn û xwêdana
Xizim û belengazan jiyawo !
Ez jî weke te zanim
Çi cûreyên xwarinê xweşe
Çi cil û berg bi bejn û bala min dikevin..
Ajotina kîjan otomobîlê hêsane û
Rûniştina kîjan qesir û qûnaxê
Ji bedena min re rehetiye…
Lê gelo tu weke min zanî ku
Çend mal li Hilêliyê, Enteriyê û
Tey bê şîv radizên ?!
Çend nesax ji bêdermanî
Dimirin ?!
Her sal
Çend şagirt û qutabî
Dûrî dibistan û zanîngehan dibin ?!

[*] Ev helbest di kovara «Raman»de belav bûye, hejmara 31/1999, Erbîl.



## Hêj min ew kes ne dîtiye[*]

Di wê rûdanê de
Dema ku kebaniya min
Ji rex min koçkir
Kesî nikarîbû
Bihêle koç neke ..
Ji çend salan ve
Di bîra min deye
Kes nikare wê
Ji bîra min bibe
Tevî ku ez
Li kesekê digerim
Ku hinekî ji barê min hilgire û
Sivik bike
Lê mixabin
Hêj min ew kes
Nedîtiye
Hêj min ew kes
Nedîtiye.

[*] Ev helbest di kovara «Peyv»de belav bûye, hejmara 6/1998, Duhok. Û di kovara «Jiyana Rewşen»de, hejmara 11/1997, Stenbol.

## Kes naxwaze bimire*


Tu kes naxwaze ku
Bimire !
Tevî ku emê tev
Bimirin
Ezê jî, bimirim
Tu jî, tê bimirî
Ewê desthilat, zordar û maldar jî
Wê bimire
Emê tev bimirin
Emê tev herin wek ku
Em nebûn
Lê bi tenê !
Wê şop û şûna
Du celeban
Bimîne;
Yek: ewên ku tev temenê xwe
Di ber xweşî, geşî û pêşketina
Gelê xwe de xerckirine
Dudo: ewên ku xwîna gelê xwe

---

* **Ev helbest di kovara «Raman»de belav bûye, hejmara 31/1999, Erbîl.**



Roj bi roj kerwanê bêkaran
Dirêj dibe ?!
Zengîno, maldaro, xwînvexwaro !
Rojekê wê ev kerwan
Te daqurtîne
Tê di nav lingên vî kerwanî de
Winda bibe û
Kes nabêje; rehma Xwedê li tebe.



**Şam şekire welat jê şêrîntire***

Leşkero, şerkero !
Vegere welatê xwe
Va çerxa bîstan bi dawî hat
Li ser xaka bav û kalên min
Tu zêrevaniya min dikî ?!
Çi dikim, çi dixwim
Di bin çavnêrîna te de
Derbas dibim…
Çendî zilm û zor
Min ji destê te
Dîtine û dibînim…
Çendî car;
Te gund û şarên min
Wêran kirine
Welatiyên min;
Dîl û sirgûn kirine …
Te xaka welatê min
Beyar hiştiye
Dehil û deviyên min

* **Ev helbest di kovara «Jiyana Rewşen»de belav bûye, hejmara 27/1999, Stenbol. Û di kovara «Dicle» hejmara 27/2000, Duhok.**



Ji bo xweşiya canê xwe
Mêtine.
Erê emê tev bimirin
Lê navê van herdu celeban
Namire, namire
Bi reş û sipî
Di dîroka gel de
Wê bê tomarkirin.



Şewitandine û
Ziman; te ji devê zarokên min diziye
Vegere welatê xwe.

✶ ✶ ✶

Şerkero, leşkero !
Êdî bese vegere welatê xwe
Rext û tivinga xwe
Bispêre zinarekî û
Di şikeftekê de, ji şikeftên
Çiyayên min raweste
Çavê dê û bavê te
Li riya hatina te qerimîn
Vegere welatê xwe.
Va dawiya çerxa bîstane
Heyamê demoqrasiyê û mafê mirovaye
Vegere welatê xwe ku
Welatiyên min jî
Li welatê xwe vegerin û
Gund û şarên xwe
Avabikin
Bi zimanê xwe bi zarokên xwe re
Biaxifin û
Ji nû ve genim, nok û pembû
Di deşt û newalên xwe de



Biçînin…
Vegere welatê xwe û
Ji heval û hogirên xwe re bibêje:
Heger welatê me bi me şêrîne
Welatê xelkê jî bi wan şêrîne û
Kurd dibêjin:
Şam şekire, welat jê şêrîntire.

✶ ✶ ✶



Tev asteng û hêzên ku hebûn
Bûn rewrewk
Çiyayê Bagokê[1]
Li ber çavê min bilindtir bû.
(Doda û Tirbesipiyê)[2]
Bi min şêrîntir bûm.
Deyax û berxwedana min
Gurtir bû…
Piştî salekê ji dûrbûna te
Tu pirsa saloxan û
Nûçeyan dikî…
Ez nebawerim, tiştekî
Giring hebe
Tevî ku gelek tişt hene
Lê hêjî ew tiştê giring
Dûrbûn û çûna te ye.

✶ ✶ ✶

Hevalo !
Heybet bavê Helebçe jî
Dipirse
Tengezarê Marînî û Keça Kurd[3] jî

---

[1] **Çiyayê hoza Hevêrka ye, dikeve navbera Nisêbînê û bajarê Cezîra Botan de.**
[2] **Doda: gundê mine. Tirbesipiyê: bajarekî mala Haco Axa ye.**



**Nameyek ji**

# Kamîranê Haco re*

Hevalo !
Hevaltî
Her tişte;
Hezkirin û dûrbûne.
Hevaltî; ev gotinên ku
Ez ji tere dihûnim û
Her dem û gav nayên.
Hevaltî ez û tu bi xwene û
Jiyan bi serê xweye.
Dûrbûn jî;
Nepeniya hevaltiyê derdike
Bi erênî û neyênî berz dike
Bi rasteqînî heval dilê xwe
Ji hevalê xwe re vedike.

✶ ✶ ✶

Hevalo !
Piştî min tu naskir

---

* **Ev helbest di kovara «Gazî»de belav bûye, hejmara 53/1999, Duhok.**

## Lêbûrînek*

Gulîstanê !
Gunehê min çiye
Te ez di nav tevna xwe de
Pêçame.
Tu li cihê xwe mayî
Te ez û tevin
Bi hev ve berdane
Çendî li ber xwe didim
Bêtir ben û rêsên tevnê
Li min têne badane.
Çendî dilivim
Bêtir tevin li min tê
Girêdane…
Ji pîra sihirdar min pirsî:
Gelo çare çiye ?
Got: bi dûr keve lawo !
Ev ne henek û tenaze;
Heger du qeder hatibin serê te

* **Ev helbest di «Peymana Edeb û huner»de belav bûye, hejmara 34/1999, Duhok.**



Dipirsin.
Welat jî, pirsa we dike
Ez jî; di nav pirsa we û
Welat de
Winda bûme, winda bûme.



**(3) Sê hevalên min in, çûne Ewrûpa.**

Ziman hebûna me Kurdane
Xweşiyê ji te re dixwazim
Herdem û çax û zemane.





Ev ya sisiyane !
Haj xwe hebe, xwe bi parêze
Hilgirtina wisa bar
Ne hêsane.
Ew bêriye, tu bêriyî
Lê gotina xelkê
Zor girane
Ku tas hat û çingiya
Tê bibe benîştê ser devane.
Gulîstanê !
Bibûre, li min negire
Barê min girane, girane
Naxwazim peşk
Li te kevin !
Tu buhayî ne erzanî
Ji bo gelê Kurd
Ez di jiyana xwe de
Buhurtime;
Doza gelê min, ji min re
Xweş armanc û nîşane
Evîna min :
Hezkirina zimanê dê û bavane
Omîd û daxwazên min:
Zimane, zimane

Ez, tu û Beko
Em bingehê civatê ne
Erê em civat bi xwene
Mane civat;
Ji erênî û neyênî pêk tê
Ji min, te û Beko ?!





## Ez, tu û Beko*

Bi çax û demê xwe re
Kêfxweş, bextiyar û razîbe
Gazin û loman
Ji Beko û Ewanan meke
Şor û gotinên wan
Diser guhên xwe re
Bavêje…
Di her çax û demê de
Beko û Ewan hene
Ez û tu emê bimirin
Wê Beko û Ewan bimînin
Wê Beko bimirin
Ez û tu emê bimînin
Ez, tu û Beko
Her emê bimînin
Em hevparên vê jiyanê ne
Ku Beko nebe
Yên weke min û te jî
Nabin, xuya nabin

---

* **Ev helbest di kovara «Jîn»de belav bûye, hejmara 47/2000, Şam.**

Konê Reş ! bes bibe dudilî
Jiyan ciwane
Hez nake kesê mirî
Esman hembêz nake
Çûk û civîkên qijilî
Mêşhingiv danayîne
Li ser kulîlkên hişk û qemirî û
Ronahî nîne;
Di ar û tiravê vemirî
Êdî bese, bes bibe dudilî
Eve qedera te
Tu jî tebayî Siyabendê gurî
Tu jî tebayî Siyabendê gurî

✶ ✶ ✶

Erê Esmerê !
Xweziya min bi Siyabendê gurî..
Bi poşa pezkoviyê nêr
Qiloç bi stirî…
Barê min girane
Kes bi min re nahilgire…
Celadet ne saxe
Dûrî min dinalî
Befrîn tirs girtiye
Hêjî dikalî



**Salek buhirî**

Qamişlo
06.04.1995

Erê Esmerê !
Sal buhirî
Sê sed û şêst û şeş roj
Zîvirîn
Hêjî sawêrên te
Li ber çav in
Evîna te
Li ser dile

✶ ✶ ✶

Îro, li ber kêla serê te
Çûm û hatim
Her sêzdeh salên me
Bi hev re
Li ber çavan buhirîn û
Pêre – pêre
Rondik gindirîn

✶ ✶ ✶

Ta ku kêla ber serê te
Gote min:

## Birîn, kul û derd*

Nizanim çima min sare
Gelo, ev çi demsale ?
Heger zivistan ba;
Wê berf û baran bibariya
Li ser van car û zinaran.
Ku buhar ba;
Wê hilm û bîna
Kulîlkên nû pişkivî bihata
Ji van daran.
Ku payîz ba;
Wê dengê qaz û qulingên mişextî
Bihata ji esmana.
Xuyaye dem havîne
Belê, çima roka vê havînê
Tînê nade ?!
Gelo !

* **Ev helbest cara pêşîn di «Bihar»de belav bûye, hejmara 5/1998. Cara din di «Birayetî: Edeb û huner»de belav bûye, hejmara 87/1998. Erbîl.**



Jîn û Nalîn
Bi dilin li vî alî
Sîpan zaroye
Nû bûye 12 salî
Mêzeke li vê rewşê
Li vî halî !!

✶ ✶ ✶

Raste jiyan ciwane
Hezdike kesên ciwanî
Belê zeriya min !
Ciwaniyê barkiriye
Ji warê min
Kul, xem û jan
Bûne siwarî
Bi hêvî me
Di vê jîna ciwan de
Sivik bibe barê min
Stûna konê min ji nû ve
Bilind bibe di nav konan de
Wek çax û demên berê
Karibim bi şad û bextiyarî
Bigerim di nav xortên Kurdan de.


## Dil mezine û cih firehe*

Di peravên deryaya
Vê jînê de
Dilê min bûye bender
Ji kul û derdan re !
Hêlîn ji êş û xeman re
Tev gemiyên li ber
Pêlên bahoza deryayê çûyîn
Xwe lê digirin,
Tev qeyik û kelekên
Stûn şikestî, çît diryayî
Lê radiwestin û
Lê dibin mêvan.
De werin
Di kovan û birînên dilê min de
Bicivin, kom bibin û rawestin
Dil mezine û
Cih firehe
06.09.1994

* **Ev helbest di kovara «Bihar»de belav bûye, hejmara 4/1997.**



Birîna min xedare
Ew rê nade,
An kul û derd, di ser min re
Bûne sîber û talde ?!
02.05.1994



## Careke din Doda

Doda! [*]
Tu hebûn û nebûna minî
Tu ji hiş, bîr û
Xeyala min dernayê
Çendî bi dûr kevim,
Nêzîk bibim,
Herim û bêm…
Çendî bûyer û serborî
Bi ser min de bibarin
Her tu ji hiş û xeyala min
Nayê der

✶ ✶ ✶

Doda !
Çendî ez bêriya wan
Rojên biçûkaniya xwe
Dikim û
Her dem û gav
Di hiş û xeyala min de

[*] **Doda: Gundê ku Xwedê ez lê dame, li ser tixûbê Serxet û binxetê dikeve, di navbera Qamişlo û Amûdê, Mêrdîn û Nisêbînê de.**



Hilgirtîne…
Di nav pêlên ramanên
Min de
Diçin û tên…
Di nav toz û tirabêlka
(Deşta Mêrdînê)de
Li ber ba dibin û
Dilîzin

✶ ✶ ✶

Doda !
Min
Di nav xaka te de
Zîl daye, şîn bûme û
Bi ser lingan ketime…
Di nav tarên te de
Fêrî:
Yadê, yabo, nan, av û xwê
bûme û
Sal di pey salê re
Bûme xwedî bejn û bal…
Li ser bênderên te
Hînî strana:
(Derwêşê Evdî) û (Bavê Seyro)
Bûme…

## Di wê oxirê de

Di wê oxira em di rex hev de
Çima te ji min re ne got
Ku şev konê xwe vegire
Tu nema min dibînî ?!
Li ser baskê teyran be
Tu nikarî xwe bi min bigihînî
Awirekê ji dêm û
Bejin û bala min birevînî..?!

✶ ✶ ✶

Va sê sal bi dûv hev de
Zîvirîn
Di nav çar dîwaran de
Bûme jar, bi kul û birîn
Hêjî ku ji nişkave
Derî li min vedibe
Der hal, sawêrên te
Tên ber çav, wek
Wan salên buhirî

✶ ✶ ✶

Di wê oxirê de, ku min zanîba



Û pêre pêre jî
Mirina kirêt û megrûdî
Gelek ji dost, heval û xizmên min
Ji ber çavan revandine…
Erê Doda !
Îro, ez ji pişt dîwarê dîrokê
Çavên xwe li te digerînim û
Hewl didim xwe ku
Cihekî ji te re
Di nav rûpelên dîrokê de
Bibînim û
Baranê bi ser te de bibarînim
Erê Doda !
Na rawestim
Ta ku ez baranê bi ser te de
Ne barînim
Ne barînim

✶ ✶ ✶

## Kul in*

Wek tûmekî kelemperê
Li ber bayê jînê di gindirim
Di nav beyarên welat de,
Li ber sînorên dexl û şûvên
Şaristaniyan digerim û dizîvirim
Hewl didim xwe
Ku dergehekî nû vekim û
Derbasî nav dexl, zevî û
Gulistanên şaristaniyan bibim
Da ku karibim
Di nav beyarên welatê xwe de jî
Tovê dexleke genim û
Şitlin gulistanên bi bîn
Biçînim
Lê mixabin !
Çendî ez wî tovî
Di axa welatê xwe de
Werdikim û
Xwe di ber de diwestînim

* Ev helbest di kovara «Jîn»de belav bûye, hejmara 46/2000, Şam.



Minê xatir ji te bixwesta
Çend gilî û gazinên xwe
Ji te re raxista
Heger xwestekin te jî
Hebana û ew xwestek
Kevçîka dil ba
Xwezî te bi xwesta
Xwezî te bi xwesta

12.05.1997



## Em herdu wek hev bê xewin!*

Dagirkero, stemkaro !
Ji ber zilm û zora te
Li ber xwe didim û
Li rêkên nû yên berxwedanê
Digerim
Weha jî,
Berxwedan min
Diwestîne û
Xewê ji çavên min direvîne…
Tu jî, da ku
Berxwedana min rawestîne û
Min bifetisîne, tu
Li gelek rêkan digere û
Gelekî tu xwe diwestîne
Weha xew ji çavên te jî
Tê dizîn û
Em herdu dibin wek hev
Bê xew.. bê xew

*** Ev helbest di kovara «Mewasim: مواسم»de, bi zimanê Erebî, ji wergerandina Hejar Ibrahîm, belav bûye, hejmara 20-21/1999-2000.**



Çeqel û rovî,
Kund û qirak
Wî tovî ji bo
Xweşiya rojên xwe
Di bin lingên xwe de
Dibin û tînin û
Dilewitînin !
Ez jî soz didim
Ku ji hewildanên xwe
Danekevim
Ta ku ez tovekî paqij
Di nav xaka te de
neçînim



## Jiyan xweristî derbas dibe[*]

**«Di çar saliya koçkirina kebaniya min de»**

Her tişt wek xwe
Bê guhdan maye;
Baholên di ser dûlabên kuncan re
Tabloyên bi hêt ve daleqandî
Kulîna livîna û
Makîneya dirûnê…
    Her tişt bê destdan
    Wek xwe maye
Lê darên di hewşa me de
Mezin bûne
«Jîn» fistanê te li xwe dike
«Nalîn» bilûz û «Celadet»[**] jî
Li bisklêt siwar dibe
Tevî ku her tişt wek xwe maye
Gelek tişt jî
Xweristî mezin bûne û
Hatine guhertin

---

[*] **Ev helbest di kovara «Peyv»de belav bûye, hejmara 9/1998.**
[**] **Jîn û Nalîn du keçên min in, Celadet kurê minî biçûke.**



## Gulîstanê ![*]

    Gulîstanê !
Gelo tu zanî
Navê vê kelehê çiye ?!
Ev keleha ku du mîr
Li ser şer dikin
Hev diwestînin
Her yek ji wan dixwaze
Vê kelehê ji xwe re
Rizgar bike…
Ev keleha ku cîranê
Ba, bahoz û lerezînêye
Gelo te navê vê kelehê
            Naskir an na ?!
Ev keleh
Navê wê
    Gulîstanê ye.

---

[*] **Ev helbest di kovara «Peyv»de belav bûye, hejmara 9/1998, Duhok.**

**Gulistanê !**

## Çawa te dergehê dil vekir*

Va çar sal derbas bûn
Û Hêjî bayê evînê dilê min
Derbas nekir.
Dil dergehê xwe
Ji evîna tu kesî re
                    Venekir
Gelekan li dergehê dil dan
Hewil dan ku dil
    Derê xwe ji wan re veke
Lê dil xwe kerokekir…
Gelekan xwe şêrînkirin
Gotin û şorên evîndariyê
Bi ser min de werkirin
Dîsa dil li wan ne vegerand
Û xwe lalokekir…
Gelekan xwestin
Dergehê dil vekin

* **Ev helbest di kovara «Peyv»de belav bûye, hejmara 9/1998.**



Erê xweristî…
Mane jiyan xweristî
Derbas dibe ?



Û tevî ku dil jenya, ponijî û
Mitale kir
Lê tu akama xwe li dil nekir û
Dil xwe korekekir

Gulistanê !
Bi tenê te dergehê
Dil vekir
Ez dibêjim qey tu
Sêhrdarî !!
Bi Xwedêkî bêje min;
Çawa te dergehê dilê min vekir
Çawa te vekir..



## Biyaniyo!
# an U.N ![*]

Biyaniyo !
Gelo tu navê vî welatî
Nas dikî ?!
Ev welatê ku
Çend cîranan ew
Di nav xwe de parvekirine !!
Gelek caran
Li ser şerkirine û
Hev westandine.
Her yek ji wan dixwaze;
Vî welatî ji xwe re
Rizgar bike û
Ji milk û malê xwe bibîne
Biyaniyo !
Gelo te navê vî welatî

**[*] Ev helbest di kovara «Mewasim: مواسم»de,bi zimanê Erebî, ji wergerandina Hejar Ibrahîm, belav bûye, hejmara 20-21/1999-2000.**

## Îsal 1998 me sed mûm vêxistin

**«Diyarî ji birayê dilsoz Diyar Doskî, helbestvan Mûeyid Teyyib û hêja Dr. Ferhad Pîrbal re».**

**Konê Reş**
**Gulana 1988an**

Îsal -1998- me sed mûm
Vêxistin û
Sed û pêncî sal
Derbas..bûn ji
Dema ku Mîr[1] ji hespa wî
Daxistin
Burca Belek li Cezîra Botan
Kavil û wêran hiştin.
Kurdistana Kurdan
Talan kirin û jihevxistin…

✶ ✶ ✶

Va sed sal derbasbûn
Me sed mûm vêxistin
Ji bo rojnameya Mîr[2]

✶ ✶ ✶

Ji sed salî ve

**[1] Mîr: Mîr Bedirxane, yê ku ji berî 150 salî ve hatiye sirgûnkirin.**
**[2] Rojnameya Mîr: Rojnameya «Kurdistan»e, ewa di 22ê Nîsana 1898an de kurê Mîr Bedirxan li Qahîre weşandiye.**



Naskir an na ?
Ev welatê ku
Çil milyon mirov
Di nav xaka xwe de
Hembêz dike û
Bi mayîn û têldirî hatiye
Pêçan..
Welatê ku zimanê welatiyên wî
Bûye bela serê wan
Welatê ku ji sala 1514an ve
Li ber xwe dide û
Roja îro cîranê ba, bahoz û
Lerezînê ye…
Te navê vî welatî naskir
an na ?
Navê vî welatî Kurdistane û
Welatiyên wî Kurd in.

Li perçê azad, perçê aram
Li başûrî Kurdistan
Bi saya serok
Kurê Barzanî û
Kabîneya sisiyan
Li Erbîla paytext
Li bûka Badînan
Xweş simîner, kor û
Mihrecan hatin lidarxistin
Bi govend û dîlan
Zînê[3] bingehê pirtûkxaneyekê danî
Bi navê bapîrê xwe
«Mîr Bedirxan»
Zanayên Duhokê
Navtarek bijartin bi navê
«Miqdad Midhet Azîzan»
Wezîrê rewşenbîriyê
Xelat belavkirin; li kesên ku dane
Ser şopa Mîrê Botan…
Nizanim,
Yên ku îsal

**[3] Zînê:mebest jê, Sînemxana Mîr Celadet Bedirxane. Sînemxan di roja 22.04.1998an de bingehê pirtûkxaneyekê bi navê bapîrê xwe «Bedirxan» li Duhokê danî.**



Mîr qeyd û bend şikandin
Dirûna çav û dev dirandin
Di sirgûniyê de
Li ber xwe da, hawar kir û
Rojname weşandin
Gazî kir û got;
Em nayên tewandin
Em nayên bişaftin..

✶ ✶ ✶

Salan dan pey hev
Stewyan û zer bûn
Kurd ji xew rabûn
Dan pey serxwebûn
Hebûn an nebûn û
Bi dehan şoreş beravêtî
Têkçûn…
Û Mîr nedît
Azadî û serxwebûn

✶ ✶ ✶

Va îsal –1998– ji nû
Piştî sed salî
Me sed mûm vêxistin
Ji bo rojnameya Mîr
Li cihê Mîr dixwest

## Na west im

Keko, xeşîmo, nezano !
Tê biweste
Fêr bibe, li cîhanê
Mêzeke û raweste,
Li heyamê cîhangêrî û
Enternetê temaşeke
Bê çendî gel pêşketine
Ji pirbûna dezgehên xweşiyê
Bûne meste

✶ ✶ ✶


Hêj tu bi dûv
Nivîsandina herdu tîpên min de
Dibeze …
Zimanê diya min
Ji te re bûye mereze
Şerme, zor şerme
Ji îro û pêve
Tu bi dûv min de
Bibeze

✶ ✶ ✶

Min tu keleh



Ev kar û bar kirin
Wê kî xelatê bide wan ?
Ji wan çêtir nabînim ku
Vê xelata xwe, li xwe û wan
Parbikim ji dil û can
Şabaş û spas ji wan re
Yên ku xwe gorî welat dikin
Birano werin
Em jî xwe bikin gorî wan.



Di nav tixûbên te de
Ava nekirine
Min tu kerî û garanên te
Talan nekirine
Dinya ferehe
Têra zimanê te jî dike û
Têra zimanê dayika min jî dike
✶ ✶ ✶
Heger tu mirovhez bî
Ez lê digerim
Heger tu aştîxwaz bî
Ew armanca min e
Heger tu pêşketî bî
Riya pêşketinê şanî min bide
Ez kiryarê wê me
✶ ✶ ✶
Keko, xeşîmo, nezano !
Êdî bese, raweste
Bes neyartiya zimanê
Dayika min bike
Tê biweste,
Tê biweste û
Ez nawestim,
Na westim…



**Ez û xemxuriya gel**

## û çiyayê Mirada

Di koxika xwe de
Maye paldayî
Bi êş, birîn û kovanên gelê xwe ve
Girêdayî
Kesî haj xemxuriya wî nîne
Ew û xemxurî bi hev re bûne
Destbirak û maye windayî
Lê hêvî û omîdên wî
Ji tev nexweşiyan
Saxlemtirin
Ji bûyeran berztirin…
Ji xwe evin yên mayî û
Ewin yên nemayî
✶ ✶ ✶
Qey qedera wiye
Ku jiyana wî bibe pêtek
Ji agirê vêketî
Xemxuriya gelê wî bike
Xortekî nû dilketî…
Çendî janê dibîne

û weha, xew ji çavên wî
Dixeyide, direve û difire..
Wek mest û lalan
Di koxika xwe de
Di nav pirtûkan de
Diqerime.. û
Ji neçarî
Hawar û gazî çiyayê Cûdî dike..û
Dibêje:
Tu bi Xwedêkî çiyayê Mirada
Çiyayê aşîtiyê
Tê rahêjî hinekî ji kul û xemên min
Mane kevoka aşîtiyê
Ew şaxê zeytûnan ji nav
Daristanên te bir
Mane te pişta xwe ji keleka Nûh re
Xûzkir û tu hatiyî naskirin
Bi «Landika şaristaniyê»
De hela welatiyên xwe jibîr meke
Û carekê xwe ji wan re jî xûz bike
Da ku di aştî, aramî û tenahiyê de
Bijîn û ji nû darên zeytûnan biçînin û
Ji aşîtiyê re
Bikin diyarî…



Ne poşmane
Bêhtir xwe dibîne
Bi serketî…

✶ ✶ ✶

Carna tam saxleme
Xwe dibîne wek teyrê baz
Di ser kûpên çiyayê
Cûdî, Ararat û Pîremegrûn re
Difire..
Carna wek zarokekî ku
Çav bi yariya xwe keve
Digirnije û dibişire
Carna bi Ehmedê Xanî re
Ta berê sibehê difikire
Bi Feqê Teyran re
Li ser peravê ava Dicle diponije
Bi tîpên çapxaneya
Husên Hiznî Mukiryanî re
Mijûl dibe û dengê xwe
Tevî dengê Mîr Celadet Bedirxan
Dike û dibêje:
«Kuro ! eybe, şerme, fehête, an hînî xwedin û nivîsandina zimanê xwe bibin an mebêjin em Kurdin..»

## Gazineke din ji Qederê

Qederê !
Em tev dizanin
Ku buhar pey zivistanê ye
Şev pey rojê ye
Aştî pey şer û berberiyê ye û
Mirin pey jiyanê ye
Ez jî wisa bi mirinê bawerim
Belê çima lê qederê !
Te temenê kebaniya min
Qurquçand
Ne di çax û demê wêde
Te ew revand
Zû te jê stand canê şêrîn
Te ji hevkir
Destê dotan ji diyê
Ji mafê wê bû
Hêjî bijiya !
Nû ketibû buhariya
Çima wisa lê qederê
Çima wisa ?!



## Jiyan

Jiyan straneke
Her kes
Guhdariyê lê dike
Hin bi kêfxweşî û dilşadî
Hin bêdil û dudilî û
Hin bi gazin û (lome)
Kengî ev stran
Bi dawê bê
Jiyana mirov
Konê xwe bardike
Vêca tu bi kêfa xweyî
Te divê bi dilşadî
Te divê bê dil ..û
Te divê
Bi gazin û girî
Guhdariya vê stranê
Bike
Dawî tev ji kîsê te
Diçe.

## Xwedêyo !

Li warê min
Herdem zivistane
Ewrên avis
Di ser çiyayên bilind re
Xweş xuyane
Lê çima ev ewir nazên
Ez nizanim ?!!
Gelo ! stewr mane
Sawêrin dilopa avê
Di wan de nemane?!
Nizanim, nizanim
An bi tenê li warê
Xiniz, kole û rêberên karbidestan
Baran dibare û buhare ?!
Nizanim, nizanim
Xwedêwo !
Bela li ser tevayî gelên cîhanê
Baran bibare
Welatê min jî di nav de
Lê bibe buhare.



## Rind nakeve

Erê, erê !
Dinya eve;
Karê mirov
Serketin û reve
Hebûn û nebûn;
Yek terze, yek celebe
Yê ku bike
Rind ê çake
Ew nakeve
Yê ku neke û
Pîs û diz be
Barûte û serserî be
Her dikeve
Yê rind ewe
Pêşkêş bike
Pîş û sazekî an
Rê û şanekî bedew.

## Oxirbe birako oxirbe

Kamîran !
Ev çi ewrê reşe
Xwe di ser Qamişloka evînê re
Dikişîne..!
Ev çi xemgîniyê
Di dêmê rêwiyên kolanên
Amûdê û Tirbespiyê de
Dibînim..!
Ev çi havîne
Germa wê ne bi xwêdan û tîne !
Ev çi demsale
Dar û şînahiyên wê
Tev çilmisîne !
Oxirbe birako oxirbe


Qey eve qedera min
Her ku ez lûsekî ji xwe re dibînim
Qiraga reş wî lûsî ji hev dixîne..!
Her ku ez singê konê xwe dikutim
Çeqel û rovî hewil didin ku singên
Min ji nav xakê derînin..



## Spehiyê !

Ji mal derketim û
Gelek xwestek
Ji min dihatin xwestin;
Nan, av, xwê û derman….
Wek pîrê xemcivîn
Di kolanê de diliviyam.
Çav bi jineke dûcanî ketim
Ku çar zarokan
Bi dawa wê girtine.
Li ber kilênîka textorekî
Dengê otomobîlan û xirecira xelkê jî
Digiha esmana, guhê min quldikir...
Spehiyê !
Kêlîka ez çav bi bejn û
Bala te ketim
Min xwestek jibîr kirin
Wêneyê wê jina dûcanî
Ji ber çavê min windabû û
Deng jî ji dor min biliya
Ez bûm wek rêwiyekî
Kerr û gêj û lal.

Yên ku di tariyê de dikin kewtkewt û
Ji  tîrêjên rojê bi tirsin
Yên hewil didin ku
Qamişloka evînê pişta xwe
Bide min,
Doda ji min bireve
Deşta Mêrdînê xwe ji min vedize
Oxirbe birako
Teyr bi refê xwe re bextiyare.





Her ku ez şivîlekek paqij
Ji xwe re vedikim
Bahozek radibe
Wê şivîlekê dibilîne…
Her ku ez koxekê avadikim
Lerezînek radibe
Wê koxê diherifîne
Qey eve qedera min
Kund lûsê xwe aniye
Ser banê min
Çiftiya çift
Bûye mêvanê min

✶ ✶ ✶

Kamîran !
Oxirbe birako here.
Teyr bi refê xwe er kamîrane
Seh jî têre xwe reyan
Gunehê min bi wan tê
Bela rawestin, bêhna xwe berdin
Ocaxê wan vemre
Yên ku xwe ji ber xunavê
Didin alî
Yên ku gul û kulîlkên nîsanê
Çilmisî dibînin

## Dilbijokim

Na, na
Dilê min nabije
Qesir û qûnaxên xelkê
Nabije
Otomobîl û malê kesekî
Dibin siya çar dîwaran û
Banekî de
Xwe rehet bibînim
Bi kurtêleke nan û
Qetek penîr têr dixwim
Na, na
Ez ne dilbijokê
Malê kesî me
Lê dilbijokê wê kêlîkê me;
Ew kêlîka ku
Yeke ciwan û spehî
Bi maldarekî ziktelêr û
Gerdenkurt re
Dimeşe û digirnije…
Hingê çendî dilê min dibije ku
Ez di şûna wî teresbavî de bim.



## Pezkoviyê, xezalê û koçerê
(Sê wêne)

**-I-**

Wa pezkoviya çiyayê Herekolê !
Bê tirs di newal û
Quntarên çiyê de
Biçêre..
Ew mîrekên nêçîrvanî nemane
Ku te bidin ber tîr û nav ravên xwe, û
Ez zanim ku tu bi hêsanî
Xwe nadî ber tîr û nav ravên
Her nêçîrvanekî..
Lê ku nêçîrvanekî weke min
Li te rast hat
Zore ku tu karibî
Xwe ji ber tîr û ravê wî
Bide alî… zor zore

**-II-**

Wa xezala deşta Mêrdînê !
Ku çerxa felekê bi te re vajî geriya
Ku dem û dewran
Bi te re xapînok derketin

Hingê di kepezê Kîkan û
Talika Cemîl Paşa re
Xwe li çiyayê Mêrdînê
Bigire.
Sênga min
Wek dergehê keleha wê
Ji te re vekiriye
Zend û bendê min
Wek bedena wê
Wê te biparêzin.

**-III-**

Wa koçera deşta Mêrdînê !
Ku tu çû bêriyê û
Şivan li te kombûn û
Te kesî berbiçav nedît ku
Bi serê mêşinên te
Bigirin..
Hingê
Gazîke pismamê xwe
Ezê di lingêling de
Di hawara te de bêm.

✶ ✶ ✶



## Çima hûn deynakin ?!

Çima hûn deynakin ?!
De ka ez jî barkim
Koça xwe bi dûv
Koçan ve siwarkim
Xaka bav û kalan
Dost û hevalan bihêlim û
Valakim
Barê kul û derdan
Dûbare bikim û
Bi ser dil de
Valakim
Nizanim !
Gelo wê taqeta dil û
Vî barê giran hebe
Bêjin min.. çima hûn deynakin ?!
Çima hûn deynakin ?!

✶ ✶ ✶

Ku ez jî barkim
Wê kî vê xaka ku
Bi neperûşkên dayika min

Di danheva pûş û bêrîvaniyê de
Hatiye lihevxistin
Lihevxîne..?!!

Wê kî govendan
Li şûnwarên ku govenda
Dayika min li ser wan
Hatiye lidarxistin
Lidarxîne..?!

Wê kî di goristanên ku
Bav û kalên min
Di wan de hatine veşartin
Bêne veşartin..?!

Gelo ez jî barkim û
Di kolanên ewrûpa de
Tûrê parsê li milakim
Kurtêla di zik kim û
Qerpolan bi ser bejnê de
Dakim?
Gelo ! ez jî barkim ?!!



## Rêwiyo ![*]

Rêwiyo !
Kes weke min
Sikak û kolanên
Bajarê min nasnake.
Ez dizanim;
Kîjan meyxane li kûye
Kîjan çayxane li kûye û
Kîjan bazarxane li kûye
Tariye
Tariyê bi ronahiyê
Naguherînim
Ez kiryarê ronahiyê me

✶ ✶ ✶

Raweste rêwiyo
Ev bajarê mine
Tu weke min, bajarê min
Nasnakî

[*] **Ev helbest di kovara «Nûdem»de belav bûye, hejmara 33/2000 Stokholm, Swêd.**

Ev ne cirîda teye
Ev cirîda mine
Ez ji te bêtir
Bajarê xwe nasdikim
Welatiyên xwe nasdikim û
Dizanim ji kîjan malê
Çend derbiderî
Li bajarên dinyayê
Kardikin
Kolanan dimalin
Solan boyax dikin û
Avaniya avadikin…
Tu weke min
Ciwan,Şivan û Hozan
Nasnakî
Ewên ku
Çixareyan di kolanan de
Difroşin
Ez û wan ji taxekê ne..
Tu weke min
Hemo, Hiso û Elo
Nasnakî
Ewên ku
Bilêtên bext û şensî



Difroşin
Ew, kurmam û kurxalên min in
Erê rêwiyo, tu weke min
Bajarê min nasnakî û
Tu weke min
Welatiyên min jî
Nasnakî.



## Ez evîndarim

Dotmamê !
Roj baş, şev xweş
    Ne cefile;
Ez evîndarim
    Evîndarim û
Gazinan ji tu tiştî nakim
    Tu tiştî ji te venaşêrim
Dibe ku hin caran
    Zarokên min
    Serê min di êşînin
Yê nesax û bawî
    Min di westîne
Xwendekara zangoyê
    Pera di revîne
Ya berzewac û kebaniya malê
        Dirav jêre mizaxtîne
Herdûyên mayî
Bi gazin û lomene, dibêjin:
                        Em sêwîne..
Dotmamê!
Necefile, ez tu tiştî



            Ji te venaşêrim û
Gazinan ji tu tiştî nakim
Ez evîndarim, evîndar.

✶ ✶ ✶

Dotê !
Gazinên min nînin û
    Veşartiyên min jî nînin
Dibe ku hin caran
Pîj, kelem û asteng
    Li pêşiya min têne danîn
Hin dost û heval
Pesnê nûçeyên minî serketî
                    Didin û
Kêm caran, na û ne carekê
Min xwe binketî nedîtiye
Ji carekê tenê pêve
Heger tu zanî ew kîjan care ?!
Ew car ev hezkirina minî te ye
Dotmamê !
Tiştekî ji te venaşêrim
Ez hez te dikim
Ez evîndarê te me
Heger veşartiyên min hebin
Bêguman ev hezkirina minî te ye.

Di nav rewrewkê de
Winda dibe
Çendî lê digerim
Ji rewrewkê pêve
Tu tiştî din nabînim…
Gêj dibim, dibim wek
Kerr û lalan û
Ji hawhaw ve dikevim..
Gelo !
Ez berdewamiyê di vê nêçîrê de
Bikim ?!
An ez xwe bi wek vê nêçîrêre
Newestînim, ev nêçîr
Ne nêçîra mine ?!

**08.04.1998**



## Nêçîrvanî

Wek kevokekê nivistiye
Li ser banê dilê min
Wek tabloya Monalîza
Daliqandiye li ber çavên min
Nizanim xemgînî an
Digirnijî ?!
Wek kulîlkek nêrgiza nû pişkiviye
Li rastê…
Dêmê wê
Ji hingiv şêrîntire
Awirên wê
Ji ava deryayê kûrtirin
Bejn û bala wê
Wek dara sipîndarê bilinde
Wek xezalekê ye
Li binê beriya Mêrdînê û
Ez nêçîrvanekim li wilo xezal
Digerim
Wê dibînim û
Didim pey şopa wê, lê

## Çend wêne Helbest*

-1-

Ji mîrşîniya Mîr Bedir-Xanê
Botî, bi tenê
Du şûn li ber çavan
Mane;
Kavilên «Burca Belek»
Di nav peravên ava Dicle de, û
«Medresa Sor» ku bûye
Qijle ji cendirmên Tirkan re.

-2-

Ta roja îro
Çiyayên Kurdistanê
Bi xwînê têne şuştin
Dibêjin; dema ku dora
Çiyayê «Cûdî» hatiye
Protesto kir, hawarkir û got:
Ez warê şaristaniyê me

*** Ev helbest di kovara «Jîn» de belav bûye, hejmara 42/2000, Şam.**



Cihê rawestandina «keleka Nûh»im
Şaxên zeytênan
Ji nav xaka min
Bûne diyarî ji aştiyê re
Çawa hûn berfa min sor dikin ?!
Çawa hûn sor dikin ?!

-3-

Ji min pirsîn:
Çima tu çîrokan
Na nivîsîne ?
Min li wan vegerand û got:
Ji ber ku jiyana min tev çîrokin.

-4-

Em hogirî hev bûn
Ez hogirî wan bûm
Ew hogirî min bûn û
Me gul û kulîlkên rengîn û bi bîn
Ji xelkên xwe re
Çandin, avdan û
Li wan belavkirin
Di dûrbûne de

## Pênûs*

Ji ezel ve
Karê dinyê eve,
Wilo hatiye,
Wê wilo here
Kes nîne ji canê xwe heznake
Ji ezezetiya xwe re
Kar û xebatê nake û
Yê ne wabe;
Tiredîne, mejî di serî de nîne,
Wek «beruwa ji qalikê xwe dere»
Dûrî civatê digere…

✶ ✶ ✶

Belê ezezetî
Tu şaristaniyan ava nake,
Tu gelan rizgar nake
Çendî avanî û qûnaxên
Mirovên ji vî terzî hebin
Çendî otomobîl

---

* Ev helbest di kovara «Jîn» de belav bûye, hejmara 45/2000, Şam.



Me bêriya hev dikir
Lê ew xelkên ku
Me gul û kulîlk
Ji wan re dikirin diyarî
Razî ne dibûn
Em hev dibînin !
Razî ne dibûn…



Li ber dergehên wan rawestî bin,
Çendî di malên xwe de
Şaristanî bin û
Çendî şevbuhêrkên wan
Li ser masan bi şadî bin
Lê sûde çiye ku;
Civata li dor wan
Di xizanî û hejariyê de
Xeriqî bin
Ji birçîbûnê merisî bin
Di belengaziyê de perçiqî bin
Bêgoman ew jiyana ku têde dijîn
Ne tu jiyane.
Şaristaniya ku xwe têde dibînin
Ne tu şaristaniye,
Vir û derewin
Xêzek ji hêsrên pênûsa min
Hemberî semyanê wan tevî ye
Wê tev bimirin
Lê
Xêzên pênûsa min namirin
Wê bimînin zindiye
Wê bimînin zindiye

✶ ✶ ✶



**Dergehê jîn û evînê**

-I-

Gulîstana li ser dêmê xakê neqişandî !
Buhişta Xwedê !
Xaka Şêx A.Selam,
    Şêx Mehmûdê Hefîd û
    Barzaniyê nemir !…
Helbesta Nalî, Goran û
                Bêkes !
Axîna Nalbend
    Salih Elyûsifî û
    Enwerê Mayî !…
Xaka pîroz !
Peristgeha pêşmergên qehreman
Peristgeha evîndarên
            Kurdayetiyê !
Dergehê dinyê !
Dergehê min
Ji derbasbûna heyamê
        Jîn û evînê re..

## -II-

Bîra dîrokê !
Ey peristgeha Laleş
Peristgeha Çarstûn
Çarmû û
Efsaneya Gilgamiş…
Ji kû destpêbikim
Ji çiyayê Pîremegrûn, Metîn û Gara..?
Ji geliyê Elî beg û Baziyan..?
Çawa bêrîkirina xwe
Ji te re şirove bikim ?
Ev bêrîkirin, his û hestên ku dawî
Ji wan re nîne…
Gelo !
Xwe bikim baranek buharî û
Dêmê teyî çiyayî
Ji nakokî û berberiyê
Bişom
Ta ku karibim
Xwe di nav
Xaka teyî pîroz de
Bigevizim û
Ramûsim…



## -III-

Buhişta Xwedê !
Başûrê pîroz !
Heger rojekê
Ez hatim nav xaka te
Bi hêvîme;
Di nav aştî û demokratiyê de
Bême pêçan
Wek nûnerekî
Evîndaran xwe bibînim
Na, na ez nûnerê
Evîndaran bi xwe me
Ez nûnerê
Evîndarên xaka te me
Ez xumxuma
Ava çemên te me
Ez sirûdeke
Kurdayetiya bi deng im
Roja ku ez bême ser xaka te
Bi hêvîme
Kurd di zindanên Kurdan de

## Paşgotinek bi kurt kurmancî

**Helbest wek nîvişkê his û hestê mirovê helbestvane. Mirovê helbestvan jî, neynika gelê xwe ye, dîdevanê heyamê xwe ye. Di rêka helbestê de, kul û janên xwe, kêf û şahiya xwe derdike. Çendî pêlên şîn û şadiya hestê wî rast, xweşbêj û lihevhatî bin, wisa ew mirovê helbestvan nêzîkî civata xwe ye, û helbestên wî di xizmeta civata wî de ne… Ji ber ku mirovê helbestvan jî nefereke ji civatê, ji mafê wî ye ku his û hestê xwe derîne… Ne xeme ku ew his û hest kesayetî be jî, ji xwe yê ku ne ji kesayetiya xwe dest pê bike tu tama berhemên wî nîne, wê berhemên wî kelê û xav bin.**

**Wek ku diyare tu carî mirov nikare ji bin bandûra kesayetiyê derkeve û heger mirov dûrî kesayetiya xwe, dûrî serboriyên xwe çû, ew mirov nikare tiştekî çak û rind ji civat û gelê xwe re pêşkêş bike… û kurdan ji mêj ve qerfên xwe bi kesên ji vî terzê mirovan kirine û gotine: «Wek beruwa ji qalikê xwe dere»**

**Di vê dîwanê de «Dergehê Jîn û Evînê» dibe ku hin helbestên wê kesayetiya min di wan de diyar be, ew jî bê hajê min, bê dilê min**



Ne dîlkirî bin
Berx têr şîr bin
Nêrgiz di beyaran de
Ne çilmisî bin..
Û baweriya min
Bi weha hêvî mezine
Ji ber ku ez pişterastim
Ji xelkên te yên ku mirovin
Û ew bawerî
Pir mezine, pir mezine.
Gulistana Xwedê !
Tu çaktirîn cihe di gerdûnê de
Xwedê hez te kiriye û
Tu kiriye
Cihê bê cihan
Warê bê waran û
Dawî tu bûyî
Dergehê min
Ji derbasbûna heyamê
Jîn û evînê, erê jîn û evînê.

Qamişlo



**xwe anîne ser pelên sipî… û tevî vê yekê gelek xwendevanan kêfa xwe ji wan re anîne.**

**Ev dîwana min ya çarane, piştî du dîwanên zarokan «Sîpan û Jîn: 1993», û «Şagirtê Bedir-Xan im: 1996» û Dîwana «Welato ! : 1998». Bi hêvîme ev dîwana nû «Dergehê Jîn û Evînê» li gor dil û daxwazên xwendevanê kurd be.**

**Piraniya helbestên vê dîwanê di kovar û rojnameyên Kurdistanî de hatine weşandin, vê paşiyê min ew dane ser hev -wek ku hûn dibînin- û amade kiriye ji çapê re, da ku wek gurzek gul ji xwendevanên zimanê Kurdî re pêşkêş bikim.**

**Heger hin kêmayî hebe jî, bela xwendevan li min bibûrin, min bibexşînin, wek ku Kurdan gotiye: «Goşt bê hestî nîne».**

**Lê ya herî giring ku ez dixwazim bibêjim; ne tenê pêşkêşkirina van helbesta ye, belê ez vê gotina Mîr Celadet Bedir-Xan di ser wan re dibînim eva ku gotiye: «Kuro ! Eybe, şerme, fehête, an hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin, an mebêjin em Kurd in».**

Konê Reş
13.01.2001

DIL MEZINE Û CIH FIREHE .......................................... 36
CAREKE DIN DODA .................................................... 37
DI WÊ OXIRÊ DE ...................................................... 40
KUL IN .................................................................. 42
EM HERDU WEK HEV BÊ XEWIN ! .............................. 44
GULÎSTANÊ ! .......................................................... 45
JIYAN XWERISTÎ DERBAS DIBE ................................. 46
GULISTANÊ ! .......................................................... 48
BIYANIYO ! ............................................................ 50
ÎSAL 1998 ME SED MÛM VÊXISTIN ............................. 52
NA WEST IM ........................................................... 56
EZ Û XEMXURIYA GEL Û ÇIYAYÊ MIRADA ................. 58
JIYAN .................................................................... 61
GAZINEKE DIN JI QEDERÊ ........................................ 62
RIND NAKEVE ......................................................... 63
XWEDÊYO ! ............................................................ 64
SPEHIYÊ ! ............................................................. 65



# Naverok

DIYARÎ ....................................................................... 3
RÊHEVALA MIN ............................................................. 4
EZ Û KENÊ HEYV Û STÊRAN ........................................... 7
XERABO ! ...................................................................... 9
XERABO ! ..................................................................... 11
EZ DELALIYÊN XWE LI KÊ BIKIM ................................. 14
HEJ MIN EW KES NE DITIYE ......................................... 15
KES NABÊJE REHMA XWEDÊ LI TE BE ........................... 16
KES NAXWAZE BIMIRE ................................................. 18
ŞAM ŞEKIRE WELAT JÊ ŞÊRÎNTIRE ............................... 20
NAMEYEK JI KAMÎRANÊ HACO RE ................................ 23
LÊBÛRÎNEK ................................................................ 26
EZ, TU Û BEKO ............................................................ 29
SALEK BUHIRÎ ............................................................. 31
BIRÎN, KUL Û DERD ...................................................... 34

**OXIRBE BIRAKO OXIRBE .......................................... 66**

**DILBIJOKIM ............................................................ 69**

**PEZKOVIYÊ, XEZALÊ Û KOÇERÊ ............................. 70**

**ÇIMA HÛN DEYNAKIN !? ........................................... 72**

**RÊWIYO ! ................................................................. 74**

**EZ EVÎNDARIM ......................................................... 77**

**NÊÇÎRVANÎ ............................................................... 79**

**ÇEND WÊNE HELBEST ............................................. 81**

**PÊNÛS ...................................................................... 84**

**DERGEHÊ JÎN Û EVÎNÊ ............................................ 86**

**PAŞGOTINEK BI KURT KURMANCÎ ........................... 90**